

ARRIVO BERLIN – 10 Projeya Entegrasyonê ji bo koçberan



Gelo tu wek koçber hatiye Bêrlînê û dixwazî herî zû tevî vê civakê bibî? Gelo te ji bo karkirinê vîn û moral heye, lê nizanî çawa tevî bazara kar a Bêrlînê bibî?

ARRIVO BERLIN bernameyek ji aliyê dewleta Bêrlînê va ye ku alîkariya te dike li warê perwerdehî û şola xwe pêş bikevî. Bêyî berçavgirtina vê yekê ku te pêştir tecrubeya karkirinê hebûye, dixwazî tecrubeya te ya xebatê were pejirandin û li dû wê yekê yî ku zûtirkê karekî bibînî, an dixwazî ji bo kar û şoleka baş bêyî fêrkirin, ji ber ku dizanî ku li Almanyayê ya girîng eve ku te hêjatiya şolî hebe; Rêkara munasib ji bo te li ber destê me ye.

ARRIVO BERLIN

- Di riya bidestxistina şola baş da alîkariya koçberan dike û li warê xurtkirina şîyan û pisportiyên wan destê wan digire.
- Li warê hêjatiyên şolî rawêjakriyê dide te.
- Ji bo te li nav kompaniyên mewqiyên fêrbûna kar û şolê dabîn dike.
- Di heyama fêrkirinê da, piştî te digire.

Armanca nêzikirina koçber û kompaniyên bicihbûyî li Bêrlînê û alîkariya her du aliyan e da ku dilniyayî pêk were ku koçber bi awayekî serketî tevî bazara kar dibin.

Me ji bo koçberan **Projeyên Naskirinê** hene:

- Kargehên fêrkariyê – Bona alîkariya bo mirovan da ku dema pêkanîna xebata pratîkî, feraset û şîyanên xwe keşf bikin.

Em her wiha **rawêjkarî û piştgiriya** raber dikin:

- Rênişandana şolî: Bi fêrkariya şolî pêşeroja xwe misoger bike.
- Hin rê ber bi hêjatiyên şolî: Rawêjkarî û piştgiriya kesane jibo koçberên ku pêşîneya wan a kar û xebatê heye.

Her wiha hin proje digel **Pêşniyarên Taybetî Pêşeyê** hene:

- Avakirin: çavkaniyên aborî yê durust bi xebata li pişka avahîçêkirinê pêk tine.
- Tendurustî: Xizmeta bo civakê – Pêşeyên miqatebûna saxlemî û perestarî
- Hotêldarî: Şolek wek mazûvanek – Fêrkirin û şolkirin li pêşeya hotel û xwarekê
- RINGPRAKTIKUM®: Vekirina deriyan ber bi bawernameyên şolî - Werin û di pratîkê da xwe biceribînin.
- Têknolojiya rêjav, germkirin û guhertina hewayê: Jîngehê biparêze û têknolojiya pêşketî bi kar bîne – Wek pêşeyek li warê Rêjav, germkirin û Guhertina hewayê
- Civakî: Hekariya tev xelkê bike – Hin pêşe ji bo Serin sar û dilin germ

Her wiha me ji bo **kompanî û şirketên ku dixwazin koçberan fêr bikin**, projeyek heye:

- Ofîsa xizmetên jibo pêşe û danûstandinê: Pêwendiyên baş navbera kar û pêşeyê – Jibo fêrkirin û bikarwergirtina koçberan



Koordiniert durch

Di rewşekê da dikarî beşdar bibî ku

- Asta pisporiya te li zimanê Almanî zêdetir ji Asta B1 be û te perwerdehiyeka baş û durust li dibistanê derbas kiribe.
- Bixwazî bi awayekî birêkûpêk û çalak beşdarî dewreyan bibî.



Xercê tevahiya van projeyan ji aliyê Rêvebiriya Senayê (Senate) jibo Entegrasyon, Bikarwergirtin û Karên Civakî va hatiye dabînkirin û belaş e.

Gefördert über

Agahiyên zêdetir li ser van projeyan li malpera Zimanê Almanî bibîne www.arrivo-berlin.de

Li vir tu her wiha hin navnîşan û microvan dibînî ku dikarî bi wan ra bikevî têkilliyê.

„Berufsausbildung in Deutschland“ Her wiha tu dê hin filman bi zimanên cûrbicûr derbarê perwerdehiya şolî li Almanyayê û agahiyên têkildarî şolan li pêşe û çiqên cûrbicûr bibînî.



Senatsverwaltung
für Integration, Arbeit
und Soziales